

## Belgenameya Têgehên Bingehîn

### Naverok

1. Destpêk .....	2
2. Prensîb .....	2
3. Hewcedariyên Serlêdanê .....	3
4. Serlêdana Alîkariyê .....	5
5. Kontrola Guncawiyê .....	5
6. Sepandin .....	6



## 1. Destpêk

Bernameya Fikra Sivîl ya Yekîtiya Ewrûpayê, bi hewla piştigiriya xebat û tevgerên heqbingeh ku piştevaniya pêşveçûn û tevkariya civaka sivîl ya li Tirkîyê dike, ji layê Delegasyona Tirkîyê ya YE'yê ve di sala 2012an de hate destpêkirin.

Di berdewamiya demê de Fikra Sivîl bi dengvedanên ji civaka sivîl ya li Tirkîyê li gel ku çendin têgehên xwemal hebandine, hin wateyên di çerçoveya bernameyê de wê ji bernameyên din ên nêzîk cudatir dike.

Ji ber vê çendê ji bo îstîfadekirina şopînerên Fikra Sivîl û ew kesên daxwaz dikin Fikra Sivîl ji nêzîk ve nas bikin, me ev belge name amade kir ku tê de hin têgehên di çerçoveya bernameyê de zêde tînen bikarînan, hatine ravekirin. Wekî Koma Piştevaniya Teknîkî ya Fikra Sivîl em li wê baweriyê ne ku ev belge name dê ravekar û alîkar be.

Bernameya ku li ser çar prensîbên wekî, beşdarvanî, guherbarî, zelalî û vehewandinê hatiye avakirin, ji guherîn û sazîkirinên curbecur derbas bûye û gihîştîye roja îro.

## 2. Prensîb

**Beşdarvanî:** Civînên şêwrê yên di maweya amadekirina pûşnûmaya bernameyê de hatine pêkanîn, dibe ku wekî xala destpêkê ya prensîbên beşdariya Fikra Sivîl bînen qebûlîkin. Piştî pêşnûmaya bernameyê, di maweya 6 salan de ji dengvedanên hêmanên cuda cuda yên civaka sivîl, şikl û şemala xwe ya îroyîn hilgirt. Di civînên saziya şêwirmendiyê ya di demên cuda de pêk hatî, şêwirmendî, grûba nîvend û forûmê de beşdarvanên Fikra Sivîl hem di pêkanîna tevkariya pêşnûmaya forûmê de hem jî bi pêşniyazên naveroka bernameyê dibin alîkarên xebitandina bernameyên astên cuda jî.

**Guherbarî:** Di çerçoveya Fikra Sivîl de, serlêdanên hemî gavê vekirî û nebûna tarîxeke dawiyê ya diyar ji bo guherbariya bernameyê hêmana herî girîng e. Dîsa, ji ber ku şertên wekî, kesayetiya hikmî -ku di bernameyên hîbeyan de zêde tînen dîtin-, serlêdana bi kompîterê hatî amadekirin yan şertê serlêdana bi inglîzî, ji holê hatine rakirin zêdetir kesên ji civaka sivîl dikarin xwe bigehînin Fikra Sivîl. Ji aktîvîst û saziyên serlêdanê dikin şertê zanîna inglîzî û kesayetiya hikmî/fermî nayê xwestin, alîkariya kesên ne xwedî sazî dikare bê kirin û ev hemû bi ser formên serlêdanê yên ji rêzê tînen kirin. Di çerçoveya bernameyê de, hem piştî pêkhatina serlêdanê hem jî di maweya pêkhatina alîkariyê de heke hewcedarî pê hebe, li ser budçe û çalakiyan dibe ku geherîn pêk bînen.

**Zelalî:** Di çerçoveya Fikra Sivîl de xwediyên serlêdanê bi rêya Pergala Agahiyê ya Fikra Sivîl (MIS), dikarin xwe bigehînin encamên serlêdanê, şirove û bersivên pisporên kontrola guncawiyê yên derbarê serlêdanê de. Li gel vê çendê derbarê serlêdanên pesendkirî de, agahî û xeberên bi ser malpera înternetê ya Fikra Sivîl re tînen weşandin zelaliya bernameyê piştrast dikin.



**Vehewandin:** Ji bo ku aktorên cuda yê civaka sivil bîn hebandin, di nava îstîfadekarên Fikra Sivil de, aktîvîst, tor/platformên ne xwedî kesayetiya hikmî/fermî, însîyatîf û rêxistinê cih digirin. Li gel vê, di çerçoveya piştgiriya Fikra Sivil de astengiyek herêmî nîne û xebatên zêdetir pêzanîn û perwerdehiyê yê ji bo bajar/herêm û qadên xebatê yê kêmîr piştevaniya wan hatine kirin, ji bo zêdetir vehewandina bernameyê dibin piştevan. Alîkariya tevlibûna komên xwedî dezavantaj bo çalakîyan, di çalakîyan de vesazkirinên ji bo malbatên bi zarok, di çerçoveya vehewandina bernameyê de tên kirin.

### 3. Pêşekiyên Serlêdanê

**Boçuna heqbinayad:** Di nîqaşên 1. Komîteya Şêwirmendiyê ya Fikra Sivil de ku di sala 2014an de pêk hatibû, wekî encamê boçuna heqbinayad “lihevkirina heq û azadiyên gerdûnî yê bi daxuyanî û peymanên herêmî û navneteweyî hatine diyarkirin” dikare bê pênasekirin. Boçuna heqbinayad, mafên ku wekî gerdûnî hatine qebûl kirin di hewîne, bêyî ku hîyerarşiyê ji layê çendanî û çawanî ve di navbera wan de ferz bike. Di nava van heqan de ji bo ku mirov jiyaneke bi rûmet bijîn hewcedariya azadiyên asgarî û mafên heywan û hawirdorê dikare bîn hejmartin. Dema Fikra Sivil xebatên bi heqbinayad pênase dike li gel mafên li Tirkîyê bi qanûnan hatine piştrast kirin, berpirsiyarên ji layê Tirkîyê ve di çerçoveya peymanên navneteweyî de hatine îmzekirin jî li ber nezerê digire. Mirov dikare ji bo van peymanan wekî nimûne, “Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekgirtî” û “Peymana Navneteweyî ya Tedbîrgirtina Her Cure Ferq û Cudahiyên Li Hember Jinan” bide.

Gelek mafên di çerçoveya peymanên netewî û navneteweyî de hatine dayîn îro nayên zanîn û nayên tedbîq kirin, tên ihmkirin yan ji van mafan nayê îstîfadekirin. Boçuna heqbinayad, xebatên **parêzvanî** û **lobiyê** yê ji bo daneqebûl kirina mijareke ku hêj wekî mafekî nayê qebûl kirin, planên çalakîyên acil yê ji bo kesên ji mafên heyî bêpar mane, hemû xebat û seknên ji bo berfirehkirina qadên mafan, di nava xwe di hewîne.

Bi vê wateya xwe ve *boçuna heqbingeh* ji *boçuna xizmetbingeh* cuda dibe. Bo nimûne; bi mebesta piştgiriya mafên ragihandina perwerdehiyê yê zarokan û derveyî xizmetên perwerdehiyê yê bi destê dewletê tên kirin, vekirina kursan di çerçoveya “boçuna xizmetbingeh” de ye; lê berfirehkirina pêşniyazên ku astengiyên li ber xwegihandina perwerdehiya belaş û yeksan ya zarokan berteref bike, saziyên cemaweriyê û xelkê derbarê astengiyên li ber xwegihandina perwerdehiyê de agahdar bike, çalakîyên parêzvanîyê yê ji bo başkirina xizmetên perwerdehiyê jî di çerçoveya “boçuna heqbingeh” tên nixandin.

Li gel ku ew zarûriyet nîne ku rêxistinên civaka sivil (RCS) yê di çerçoveya Fikra Sivil de alîkariyê dibînin wekî saziyên heqbingeh bin, lê xebatên di çerçoveya bernameyê de tên birêvebirin divê bi boçuna heqbingeh hatibin saz kirin.

**Tevkariya civaka sivil:** Derbarê xebatên di çerçoveya Fikra Sivil de piştgiriya wan hatiye kirin yek ji krîtereke sereke ew e ku derbarê xebata ku tê birêvebirin ji bo civaka sivil ya li Tirkîyê, torsazî, berfirehkirina kapasîteyê, berdewamî, şûra pêhesînê û parvekirina tecrûbeyan pêk bîne. Ji ber vê



çendê, bo nimûne, herçiqas xebatên xizmetbingeh yan tenê akademîk gelek girîng bin yan bi naverokên xwe ve muhim bin jî di nava wan xebatan de cih nagirin ku Fikra Sivîl daxwaza piştgiriya wan dike.

**Pêşekiyên bernameyê:** Hin pêşekiyên Fikra Sivîl hene û giringiyê dide hevsengiya piştgiriyan li gel van pêşengiyên.

- 1- Pêşvebirina kapasîteyên şopandin û parêzvaniya aktîvîst û RCS'yan.
- 2- Pêşvebirina kapasîteyên finansî û rêxistinî yê aktîvîst û RCS'yan
- 3- Bi çalakiyên zêdekirina hişyariyê yê RCS û aktîvîstan ji bo girseyên heyî/civaka sivîl pêşvebirina kapasîteyên ragihandinê,
- 4- Di navbera aktorên civaka sivîl ya Tirkîyê û welatên YE'yê, IPA û ENI'yê û di navbera aktorên civaka sivîl yê li Tirkîyê bi xwe de pêşvebirina hevkarîyê û îmkanên torsaziyê.
- 5- Xuyakirina xebatên heqbingeh yê aktîvîst û RCS'yên Tirkîyê û zêdekirina piştgiriya cemaweriyê,
- 6- Zêdekirina xuyabûna piştgiriya YE'yê ya ji bo civaka sivîl û mafên bingehîn.

**Komên/herêmên xwedî dezavantaj:** Ew kom/herêmên ji ber taybetiyên xwe yê xweser di civakê de tîst piştguhkirin, pêşveçûna wan tê astengkirin, alîkariya wan nayê kirin yan ji derketên heyî bi awayekî adilane îstîfade nakin wekî "xwedî dezavantaj" tîst pênasekirin. Yek ji pêşekiyên Fikra Sivîl ji bo kom/herêmên xwedî dezavantaj derketên zêdetir pêk bîne û di berdewamiya bernameyê de ji bo tedbîqkirina vê çendê hin tedbîran bistîne.



## 4. Serlêdana Piştewaniyê

**Sîstema Agahdariyê ya Fikra Sivîl:** Sîstema Agahdariyê ya Fikra Sivîl, sîstemeke onlayn e ji bo proseya pêwendîdanîn û ragihandinê ya li gel xudanên serlêdanê. Di vê pergalê da guncawiya serlêdanan tê kontrolkirin û serlêdan têne qebûlkin. Aktîvist û nûnerên saziyên sivîl ji bo bikaranîna vê sepanê, divê bibin endamê sîstemê. Piştî endamtiya sîstemê di her kategoriyê da serlêdan têne kirin û xudanê serlêdanê dikare bibîne ka kontrola serlêdana wî di kîjan astê de ye. Herwiha dikare pêwendiyê dane di gel Koma Piştewaniya Teknîkî, pirsgirêkên xwe ji wan re bêje û ji pisporên vê komê bipirse, der heqê serlêdana xwe da bigehe agahiyên berfireh.

**Forma Serlêdanê:** Ev forma ku li ser Malpera Fikra Sivîl û Sîstema Agahdariyê peyda dibe, ji bo ragihandina serlêdanê divê bê dagirtin. Li gel agahiyên sereke (nav-paşnav-telefon-maîl) ên xudanê serlêdanê divê sebebê serlêdanê bê eşkerekirin (20 xal). Ev form li gel beşa budçeyê ji 8 pirsan pêktê.

**Serlêdan, piştewanî û xebat:** Bi saya piştewaniya Fikra Sivîl, heta niha gelek aktîvîstan û saziyên sivîl, xebatên xwe yê mafparêziyê pêk anîne. Fikra Sivîl ne programeke piştewaniya hîbeyê ye, alîkariya xwe wek piştewaniya temînkirinê dide. Ji ber vê jî, ne tenê ji bo projeyên yekpare û mezin lê ji bo xebatên biçûk jî hûn dikarin daxwaza piştewaniyê bikin. Lewma jî karên ku di çarçoveya piştewaniya Fikra Sivîl de têne rêvebirin, ne wek “**proje**” lê wek “**xebat**” têne binavkirin.

**Piştewaniya temînkirinê:** Piştewaniya Fikra Sivîl, ne wekî programên piştewaniya alîkariya neqdî ya pereyan e; alîkariya wê wekî temînkirin û hîbekirina mal û xizmetan e. Aktîvist an jî saziya sivîl ku daxwaziya piştewaniyê dike, ji Fikra Sivîl bo xebatên xwe pereyên neqdî (cash) wernagire. Li şûna wê, pêdiviyên xebatê ji aliyê xudanê serlêdanê ve wek mesref yek bi yek tînin nivîsîn û heqê wan mal û xizmetan ji aliyê Koma Piştewaniya Teknîkî ve boxudanên mal û xizmetan tînin dayîn. Li gel vê, şexs an jî saziya ku piştewaniyê wernagire, divê guh bide hinek rêzik û qaîdeyên wergirtina mal û xizmetan. Ev rêzik û qaîde di Rêbera Rêvebirina Xebatê de bi hûrgulî hatine nivîsîn.

**Proseya rêvebirina xebatê:** Piştî kontrola guncawiyê, ji bo xebatên ku hatine pesendkirin, proseya rêvebirina xebatê dest pê dike. Ev prose, kontrola guncawiya xebatê, hemû kar û faalîyetên xebatê, karûbarên budçeyê, raporên xebatê, maweya çavdêrî û nirxandinê di nav xwe de dihevine. Di vê proseyê da, mumkin e ku xudanê serlêdanê bi telefon, hevdiîtina li ofîsê û bi rêya ragihandina Sîstema Agahdariyê di gel Koma Piştewaniya Teknîkî pêwendiyê dane û eger hewce bike dikare li ser budçeya xebatê guhertinan jî bike.

**Pêşengên civaka sivîl:** Li Tirkiyeyê, ji gelek qadên herêmî û netewî, gelek aktîvist û saziyên sivîl hene ku ji xebatên tax û kolanan heta xebat û çalakiyên navdewletî, bi awayekî çalak xebatên xwe didomînin û xwedî tecrube ne. Cudahiya Fikra Sivîl ji program û fonên dîew e ku bi saya mekanîzmaya piştewaniya temînkirina mal û xizmetan, dikare piştgiriya gelek xebatên “aktîvist” û “saziyên civakî yê sivîl” bike û alîkariyê bide xebatên wan. Lewma jî, tevî şexs û însiyatîfên aktîvîstan, platform, komîsyonên baroyan, sendîka, kooperatîfên mafparêziyê, şirketên ku karên xêrxwaziyê dikin,



yekîneyên zanîngehan yê mafparêziyê ku têkiliya wan bi saziyên sivil ên civakî heye, gelek pêkhate û sazî dikarin piştevaniya programên Fikra Sivil wergirin.

**Koma Alîkariyê ya Fikra Sivil:** Koma Alîkariyê, mekanîzmayeke piştevaniyê ye ji bo sazî û aktîvîstan ku bikarin di nav Sîstema Agahdariyê da li ser kategoriyên piştgiyê, xal û bendên guncaw ên budçeyê, rêbera serlêdanê, pêkanîna naveroka serlêdanê, krîterên kontrola guncawiya xebatê û rêbera rêvebirina xebatê, her cure pirsên xwe bikin û alîkariyê bixwazin. Bi rêya e-mailê, hindê rojên heftiyê bi rêya telefonê an jî bi daxwaza civîna rû bi rû li ofîsê, xudanê serlêdanê dikare ji Koma Alîkariyê bo xebata xwe an jî der heqê Fikra Sivil da piştgiyê teknîkî û agahiyan wergire.

## 5. Kontrola Guncawiyê

**Kontrola guncawiyê:** Hemû serlêdanên ku bo Fikra Sivil hatine şandin, ji aliyê hinek pisporên serbixwe ve -ku di nav Koma Piştevaniya Teknîkî de cih nagrin- li gor rêzik û qaîdeyên di forma serlêdanê û forma kontrola guncawiyê da hatine nivîsîn, têne nirxandin û guncawiya wan tê destnîşankirin. Di proseya kontrola guncawiyê da muqayesekirin tune û xebat li gor tarîxa serlêdanê têne rêzkirin. Li gor vê, kîjan serlêdan pêşî gehîştibe ber destê pisporên Fikra Sivil, ew beriya yê dî tê nirxandin û guncawiya wê tê kontrolkirin. Di çarçoveya programê da li gor şert û mercên budçeyê û kapasîteya Koma Piştevaniya Teknîkî, xebatên ku guncaw hatine dîtin, piştevaniya Fikra Sivil werdigirin. Li ser Sîstema Agahdariyê, xudanê serlêdanê dikare teqîb bike ka serlêdan di çi astê de ye.

**“Yê pêşî were piştevaniyê werdigire”:** Cuda ji program û fonên dîtin, sîstema Fikra Sivil her dem bo serlêdanê vekirî ye, roja dawî ya serlêdanê nîn e û li gor şert û mercên budçe û çavkaniyên programê, tarîxa dawî bo serlêdanê nayê ragihandin. Bi ser de jî di navbera serlêdanan de pûandayîn û muqayeseya serkeftîbûnê an jî pêşengiya naveroka serlêdanê nîn e. Lewma jî li gor tarîxa serlêdanê “pêşî kîjan serlêdan hatibe kirin, ew piştevaniya xebatê werdigire”. Serlêdan li gor vê qaîdê, ji aliyê Koma Piştevaniya Teknîkî ve têne rêzkirin û bi dorê, guncawiya wan tê kontrolkirin.

**Têkiliya fiyet/faydeyê:** Ev têkilî,berhemdarî û kêrhatîbûna budçeyê nîşan dide. Xebata ku bo piştevaniyê hatiye pêşniyazkirin, divê li gor armancên xebatê û guncawiya budçeyê be. Xebatên ku li gor armancên xwe budçeyeka guncawtir dixwazin, li gor têkiliya fiyet/faydeyê baştir in û xebatên ku budçeyeka zêde dixwazin li gor vê têkiliyê hinekî zeîftir têne dîtin. Ji ber wê jî divê neyêjibîrkin ku ‘esas mesele ne budçeyeka “pîrr kêr” e lê budçeyeka “realîst” e.

**Guncawiya rêvebirina xebatê:** Di nav kontrola xebatê da, guncawiya rêvebirina xebatê yek ji wan xalên muhîm e ku ji aliyê pisporên kontrolê ve tê nirxandin. Di çarçoveya guncawiya rêvebirina xebatê da, tê nirxandin; gelo ev xebat çiqas pêkan û realîst e, armanc û encamên xebatê çiqas li hev tînin, aktîvîst û saziya sivil ku xebat pêşniyar kiriye, di qada vê xebatê da çiqas xwedî agahî û tecrube ye û paşxaneyê kapasîteya rêvebirina xebatê heye an nîn e.

**Meyla berdewamiya xebatê:** Wekî gelek program û fonên dî, armanca Fikra Sivil jî ew e xebatên ku piştevaniya wan kiriye di nav proseya destpêk û rêvebirinê da, meyla berdewamiya xebatê biparêze û armancên xebatê pêk bîne. Di nav vê meylê da ev taybetî hene: Aktîvîst an jî saziya sivil divê bikare





📍 Güniz Sokak No: 32/9 06700 Çankaya Ankara  
☎️ +90 312 428 05 61/62  
📠 +90 312 428 05 63  
✉️ info@sivildusun.eu  
🌐 www.sivildusun.net

hebûna xwe biparêze, bi fon û finansmanên alternatîf xebatên xwe berdewam bike û kapasîteya xwe ya çavkaniyên însanî û finansî xurttir û zêdetir bike. Ji ber vê jî Fikra Sivîl pêşengiya alîkariyênade xebatên ku tekraren piştevanîyê dixwazin.



*Sivil Düşün is a European Union programme.*

## 6. Cîbicîkirin/Rêvebirina Xebatê

**Vîzîbilîte:** Ji bo ku piştewaniya Fikra Sivîl ji aliyê gelek aktivîst û saziyên dî ve jî bête zanîn, di hemû xebatên çapbûyî û dijîtal de divê logoya Fikra Sivîl û alaya Yekîtiya Ewropayê hebe. Hûn dikarin di belgeya Qaîdeyên Vîzîbilîteyê de van rêzik û qaîdeyan bibînin. Di çapkirin û belavkirina materyalên van çalakî û xebatan da-ku bi piştewaniya Fikra Sivîl tene rêvebirin- divêev rêzik û qaîde bêne parastin. Di hin rewşan da ji bo guhertina van qaîdeyan hûn dikarin pêwendiyê danin di gel Koma Piştewaniya Teknîkî.

**Mobilîzasyon û pêkanîna networkê:** Di civînên şewirmendî û pêkanîna rêxistina Fikra Sivîl da pêdiviyên sereke yê wek mobilîzasyon û pêkanîna networkekê derketiye meydanê. Di nav sepanên Fikra Sivîl da Kategoriya Piştewaniya Pêkanîna Networkê heye ku xudanên xebatê dikarin di gel saziyên sivîl û aktivîstên dî pêwendiyên saz bikin û hem li Tirkiyeyê hem jî di qada navdewletî da piştgiriya xebatên dî yê mafparêziyê bikin. Karûbarên pêkanîna networkê, hevparî û şîrkatiya di gel şexs û saziyên dî, parvekirina tecrubeyên qadê û serdanên komxebatan di çarçoveya mobilîzasyonê da tene nirxandin. Serdan û mêvandariya aktivîst an jî saziyên netewî û ji qada navdewletî jî çalakîyên sereke yê mobilîzasyonê ne.

**Mafparêzî û xebatên lobiyê:** Mafparêzî, wek hemî çalakî û xebatên parastina mafan, pêşvebirin û berbelavkirina wan û rêlibergirtina bînpêkirinamafên mirovan e. Bi rêya kampanyayan balkêşana ser mafan, bi lêkolînan peydakirina encamên bînpêkirina mafên mirovan, teqîbkirina proseya çêkirina zagonan û hazirkirina raporên derheqê wan proseyên qanûnî da, parvekirina van raporên di gel raya giştî û saziyên fermî, hinek ji kar û xebatên sereke yê mafparêziyê ne. Herwiha di bin sernavê mafparêziyê da **faaliyetên lobiyê** jî cih digrin lê armanca van faaliyetan, rasterast an jî bi awayekî dî pêkanîna tesîreke xurt e li ser rêvebir, desthilatdar, saziyên fermî û parlamentoyan. Ji bo xebatên lobiyê piştewani û hevkarîya van sazî û dezgehên, herwiharasterast an jî bi awayekî dî pêwendîdanîna di gel wan şert e.

**Pêkanîna rojevê:** Armanca van cure xebatan ew e ku ji bo hin qadên mafên mirovan, zêdetir şexs an jî sazî di rojeva xwe da cih bidin wan, balê bikêşin ser wan meseleyan û hessasiyeteka civakî li ser van qadan peyda bibe. Pêkanîna rojevê bo gelek qad û mijaran mumkin e. Bo nimûne, wekheviya cinsiyetê, mafên zarokan, parastina berdewamiya ekolojîk an jî mafên heywanan. (Û gelek qad û mijarên dî yê mafparêziyê...) Di kîjan qadê da be ferq nake, divê hemû kar û xebat bi baldarîbehsa van mijaran jî bikin û di rojeva xwe da cih bidin wan jî.

**Pêşvebirina hevkarîyê:** Di çarçoveya xebatan de gelek derfetên şîrkati û piştgiriye hene ku mirov dikare van hevpariyên xebatê berfirehtir bike. Pêkanîna piştgirî û hevkarîyekê, bo nimûne di karûbarên pêkanîna networkekê da, hem bi sektorên taybet ên karsaziyê hem jî bi saziyên fermî ra, dibe ku rê û derfetên nû veke ji bo saziyên sivîl, encamên xebatê xurttir bike û tesîra xebatê zêdetir bike.

- **Hevkarîya saziyên fermî û saziyên sivîl:** Xebatên ku dê li gel saziyên fermî bêne kirin, dibe ku karûbarên wekî pêşvebirina kapasîteyê, pêkanîna rojevê, balkêşana ser mafparêziyê an jî faaliyetên lobiyê jî di nav xwe de bihewînin.





- **Hevkariya karsazan û saziyên sivil:** Xebatên wekî berpirsyariya civakî ya saziyê, pêşvebirin û zêdekirina kapasîteyê û peydakirina finansmanê, mumkin e li gel karsazan bêne rêvebirin.
- **Hevkariya saziyên sivil û saziyên sivil:** Kar û xebatên parvekirina tecrubeyan, faaliyetên lobiyê, pêkanîna rêxistinên aktîvîstan û saziyên sivil, pêkanîna networkekê û ji bo gelek saziyên sivil avakirina saziyeke mezintir, di nav van cureyên xebatan da cih digrin. Lêbelê hevkarîya saziyên sivil li gel saziyên dî yên sivil ne tenê bi vî rengî pêk tê, herwiha firseteka baş e ji bo ku saziyên sivil di nav xwe da rêxistineke mezintir ava bike.

**Koma Piştewaniya Teknîkî:** Ev kom ji aliyê Delegasyona Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewropayê ve hatiye avakirin û armanca wê ya sereke piştewaniya aktîvîst û saziyên sivil e ku di çarçoveya piştewaniya Fikra Sivil da xebatên wan hêjayî alîkariyê hatine ditîn. Ev kom, di gel şîrketên serbixwe yên şewirmendiyêku hemû jî endamê konsorsiyûmekê ne, bi îmkîna peymanî serwîsê, ji aliyê Delegasyona Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewropayê ve hatiye pêkanîn. Kar û berpirsyariyên sereke yên vê komê ev in: Amadekirina bingeha programê, çêkirina belgeyên fermî yên programê, qebûlkirina serlêdanan, pesendkirina serlêdanan û kontrola guncawîya wan, rêvebirina kar û xebatan, çavdêrîkirina xebatên piştewaniyê, rêveberîya çalakîyan (Foruma Saziyên Sivil, kampanya, perwerdehî, civînên agahdarkirinê û hwd.) û rêvebirina xebatên ragihandinê.

**Saziyên bingehîn:** Saziyên herêmî yên nû dest bi xebatê kirine, kapasîteya wan kêmtir e an jî wekî rêxistineke xweser derketine meydanê, di nav saziyên bingehîn da tîrêjê hesibandin. Ev cure sazî, rasterast bo parastina mafên xwe û pêşvebirina mafên mirovan kar dikin û di vî warî dasazî û dezgehên xweyên bingehîn temam dikin. Bo nimûne, saziyeke LGBTI+ ku ji kesên LGBTI+ ve hatiye avakirin an jî komeka ji taxekê ku ji bo mafê niştecîhbûnê li hember bînpêkirina mafên şênîyên taxê tekoşînê dimeşîne, wekî saziyên bingehîn tîrêjê binavkirin.

**Saziyên Herêmî:** Saziyên sivil ên ku li bajarekî an jî herêmekê kar û xebatên xwe didomînin, taybet ji bo çareserîya derd û kulên wî bajarî/wê herêmê, pêşketina însanî û pêşvebirina çandîniya/sewalvaniya herêmê dixebitin, wekî saziyên sivil ên herêmî tîrêjê pênasekirin.

